Welat
Çandî - Giştî - Mehane
Hejmar 12
15/7/2014

# Welat

## Heyva remezanê ...
## bîranîn vedigerin



Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- mehane

Sernivîser:
**Aras Yûsiv**

Desteya rêvebir:
**Xweşnav Heso**

Dîzayner:
**Hesen Berzencî**

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye.

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne.*

**ji bo têkiliyê:**
welat.press@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



# PEYVA WELAT

## Piştî kovara Welat... aniha Welat fm

**Aras Yûsiv**



Tevî hemî pêşketinên li ser rûyê cîhanê dibin û li gelek cihan nema çûna ser heyvê tiştekî seyr e lê li ba hin miletên din siwarkirina tirênan firokeyekê hîn tiştekî seyr e, li nav me - kurdên sûriyê – rengên din ên seyrbûnê hebûn , ji nav wan û ji ber e azadiyê ji û pêşketinan bê par bûn derketina bajarê me di televizyonekê de bûyereke ne normal bû û kêfek dehtaq dii dilê me de çêdikir …û di van salên dirêj de wek sêwiyên pêşketinan û azadiyê me-kurdên sûriyê- li xwe dinerî, weku em mirov bin û ne mirov bin an jî weku em mîna mirovan bin.

Li ba me li rojavayê kurdistanê û ji ber qedexekirina her tiştî ta bi çapkirina peyveke kurdî, diket bala me de ku jiyan li ba miletan tevan wisa ye..lê ya rast ew bû ku li derveyî Sûriyê û rojhiata navîn û hin welatên ku rêjîmên totalîrîte hukmê wan dikin tiştekî zehmet tunebû.

Li wan welatên û ji ber hebûna azadiyên giştî her mirovekî dikarbû cihê xwe bibîne û her sazî an dezgehekê dikarîbû asoyekî xwe bibîne û bibe rastî..û di warê medya de li wan welatan destûr hebû ku tu bibî xwedî rojname, kovar, radyo û televizyon eger piştgiriyeke te ya madî hebe an em dikarin bêjin ku hin alî hebûn ku wan bi xwe dikarîbû bi projeyn xwe rabin û ji rojname ta televizyonan vekin.

Piştî hersê salên şoreşê li Sûriyê û peydabûna hin asoyên azadiyê êdî derfet çêbûn ku gelek kes xwe bibînin ku ew dikarin tiştekî bikin an li dûv xewn û xeyalên xwe di warê medya de bikevin û dikarîbûn bi serpêhatiyên bedew rabin.

Li herêmên kurdî li Sûriyê jî hin ji van xewnan hebûn û gelek saziyên ragihandinê ava bûn, ji nav wan saziya me ya Welat a ragihandinê ku bi kovareke mehane dest pê kir û îro dest bi projeya xwe ya nû ya vekirina êzgeha welat fm dike .




Bi hezkirin û hêviyên we ..hêviyên me jî geş dibin ..em ê hewl bidin ku herdem xewnên we wergerînin.. hûn jî me ji hezkirina xwe bê par nekin.

تبنّى ثورة
adopt a revolution

# Dîsa ziman

Helbest Yûsiv

Gelo ti milet wek yê kurd heye ku radibe û rûdine û dibêje zimanê me û zimanê me?, û eger ev yek li ba miletên din hebe gelo ew çawa jiyan dikin, an çawa tirsa wan li ser zimanê wan dihêle ku ew karîbin xweşik bijîn?

Li seranserî dunyayê bê guman weku miletê kurd li ser zimanê xwe ji mirinê bi tirs e tu milet nîne, helbet sedemên vê yekê hene û ew jî ku ev milet hemî şêweiyên zordariyê li ser wî hatiye bikaranîn û zimanê wî jî ji binpêkirin û tunekirinê bê par nemaye, û ziman ma riya tekane ku ev milet nemire, lewra ev tirs li ser zimanê wî bi vî rengî çêbû .

Ji mafê me ye îro em bipirsin ka rewşa zimanê me yê kurdî çiye ..bela em li ser rewşa wî li rojavayê kurdistanê bi taybetî biaixifin ka ew çawaye û gelo ew ji gefa mirinê xelas bûye an na .

Belkî korsên fêrkirina ziman li her deverê ji rojavayê kurdistanê belvkirîne û di dibistanan de jî dersên zimanê kurdî têne dayîn lê gelo ev herdu an hin hewldanên wek wan bes in an na?

Ya rast ew e ku ev korsê ziman ku heyvekê dirêj dike, piştî wê têkilî bi ziman re neyê qutkirin , û korsên dîtir hebin û li dibistanan gelekî dana derseke kurdî bi vî rengî nemîne lê sal bi sal madeyên xwendinê bi zimanê kurdî werin dayîn.

Li gel van tiştan pêwîste tevgera siyasî ya kurdî dema ku bi gelê xwe re çi li kolanê û li ser internêtê hewl bide ku bi zimanê xwe yê dayikê pê re biaxife.

Li aliyekî din tê xwestin ku pştgirî ji kesên ku bi kurdî dinivîsînin çêbibe , herweha piştgirî ji saziyên ziman re bêtir bibe.

Belkî ev ezmûneke zehmet be bo em zimanê xwe biparêzin lê îro ev yek girêdayî me ye û nema girêdayî rêjîma Esed e lewra gavên bi leztir tên xwestin bo em ji van tirsan xelas bibin û pirtûkxaneya xwe ya kurdî bibînin wek ya hemî miletan …û wê çaxê dilê me dikeve cih de.





## Dilê welatê min

**Narîn Omer**

Ne çep û ne rast
Welatê min!
Erê raste ez ne konevanim
Tevna jiyana min rast rast dirêsê
Ne çep û ne rast, ne ev û ne ew
Xaçepirsên toreya raman û coşeyên min
Têkil hev dibin bi tek û bi komikî
Di dawî de hemî li ser radeyek hevdirv dijîn
Perdeyên saza dilê min
pîvanên dan û standinê şêweyên
dilnewazî bi saztînin
Awazên awarte « nerezgînî» têde hîçin
Ji ber kû bi şahrezayî
têgehişta li hevkirinê bi taybetmendî
min di navbera hişê hastên xwe de
zeft kiriye
welatê min
raste ez ne konevanim
ez ne siyasetmedarim
lê belê pênûsa min leganek zîze
li himber hemî bager û bazorên
bêdawî.



## Dahola Demê

**Hozanê Girkundê**

Dahola demê her li dare
Û em di nêva mija xewnan de
..Li xwe digerin
Di nêva welatekî dil bi kul
Di nêva asîmanekî bi êş û buhareke
Bê gul…em kêlîkên temenê xwe
Bi derewên hêviyan
Dixapînin û derbas dikin
Ma ta çi demê em giriyên xwe
Bikin destarên hêsiran
Û xweşikbûna evîna xwe bikin xemla
Darbesta kundan
Û xaka welatê xwe
Bikin kişwara kînê
Bikin bêrîk jibona kenê erzan
Ku îroj li sûka bêbextiyê
Dîroka kevnar ji dilê salan didizin
Û bedena hebûnê
Di zikê zemîneke sar de vedişêrin
Û dîmenên dîwaran bi ayetên dojehê
Dixeniqînin
Buhişteke ne afrandî
Di gorisanên mirinê de
Bi tîpên xweliyê
Kevalên periyan
Di hizrên xwe de nîgar dikin
Pûtên fireştiyan xwehre-
mendên bê nav
Birînên bi jan
Di sînga welatê min de
Hêdî hêdî bi cî dikin
Her tişt rengê xwe davêje
Û lehiya dînbûnê
çîrokên xemgîniyê
Hişên me talan dikin
Û em ber bi jîneke wenda
Kelo girî dibin
Û hastên me bi agirên dûriyê
Eşqeke bê sînor dişewşinîne
giyan
Û hîna bêrî kirin
Li warekî bi evîn digere
Ta ji nûve xwe ji nebûnê
vejîne



# Jina Kobanî di bîst salan de ji têkoşînê

Şêrîn Temo

Jina Kobanî ji bo bidestxistina mafên xwe gelekî azar dît , piştî dewranekê ji bêparî û bindestiyê. Jina Kobanî ji mêr re teqez kir ku ew dikare di gelek waran de kar bike û dikare bawernameyan bidest bixîne, ev piştî ku jina Kobanî ji mafê xwendinê jî bêpar bû, û di malbata herî azad de , jinê tenê heya bidestxistina bawernameya amadekirinê dixwend, hema niha em dibînin ku jina Kobanî mamoste ye ,parêzere û endizyar û pijîşk e, ango jinê di bîst salên dawî de dikaribû hemû bawernameyan bidestê xwe bîneû bi cih bike, weke wê weke mêr, û ta ku li kêlek mêr kar bike, ne tenê bawenameya zanîngehê çeka wê bû, lê belê di gelek karên din de hebûna xwe teqez kir wek karê terzîtiyê û yê kuwafêrê. Ev piştî ku karê wê tenê perwerdekirina zarokan û kebanîtiya malê bû, di vî warî de xanim Mîdya Kendeş dibêje: “ karê min terzîtiye û ez vî karî bi dil û can dikim , û bi saya pereyên ku jê tên, ez bi hevjînê xwe re di warê abûrî de alîkariyê dikim, û ev karê min , nabe bendek di nava min û perwerdekirina min ji zarokên min re”.

Di warê bidestxistina mafên xwe yên civakî de , jina Kobanî bûye xwediya gotina pêşî û ya dawî di hilbijartina hevjînê xwe de, û herwiha wê mafê veqetandinê di rewşên naçar de bidest xwe  xistiye.

Herwiha jina Kobanî xwe ji gelek kinc û şopên kevneşopî rizgar kiriye wek ebe, kofî û ji bilî wan jî.

Di warê rêzanî de,  jinan li Kobanê rêxistin û komele û kombend saz kirine , û tevlî partiyan bûne. Îro jina Kobanî wane û semîneran dide, doza mafê xwe li pêşberî kamîre û mêdiyan dike, di derbarê vê yekê de , çalakvan Necah Kût (seroka kombenda Hîro



ya jina Kurd li Sûriyê) dibêje:

“ jin hevpara mêr e di civakê de, jin nifşan perwerde dike, û mafê wê heye ku berpirsyariya xwe ya rêzanî û civakî hilgire, ji ber ku ew nîvê civakê ye.”.

Dêmek ; jina Kobanî bi vîna xwe hemû dergeh li pêş xwe vekirin, û li benda mêr nema te ku hinek ji mafên wê bide wê.

Niha jin di hemû qad û waran de kar dike, ta ku teqez bike ji xwe re û ji civakê re, ku ew hêjaye ku nîvê civakê be.



# Li Efrînê dema berhevkirina sebzeyan e

Welatiyên Herêma Efrînê dest bi berhevkirina berhemên wekî qawin, bacanên sor, petata û cûreyên din ji sebzeyan kirin. Nûçegihanê Hawar ê yê derbarê vê mijarê de hin wêne ji nava zeviyan girtin.

Cotkarekî ji navçeya Raco ya Efrînê diyar kir ku bacanên sor li navçeya wan gelekî kêm dihatin çandin, ji ber ku tevahî erdên wan bi darên zeytûnê hatine çandin û tûleyên bacanan ziyanê digihînin dara zeytûnê. Lê dîsa jî gelek cotkar di nava darên zeytûnê de zebzeyan diçînin. Her wiha ji ber ku sala borî ji ber ambargoyê gelek zehmetî di peydakirina sebzeyê de dikişandin û gelek buha bûn.

Di sala borî de buhaya kîloyek bacanên sor 300 lîreyên Soriyê derbas kirin. Her wiha cotkarekî ji navçeya Mabeta diyar kir ku wî nêzî 18 donim erd bi petata û qawinan çandiye û da zanî ku ew li gel hin cotkarên din ava avdanê jî li hev parve dikin.

Wek tê nasîn ku herêma Efrînê zengîne bi keskayî û cur bi cura sebzeyan , ji bilî darên zeytûnan hewayê wê derê alîkare di geşbûna çandiniyê de .. Efrîn ber bi dema danhevê diçe , di destekî de bi zeytûnan şad dibin û bi yê din sebseyên xwe didin hev

Jêder: ANHA



# Çandina baxçan diyardeyek kevnare , dîsa vedgere û xwe nû dike



GULAL LIYANÎ

Ji mêj de miletê Girkê legê baxçeyên şînahî li hewşan de diçînin, lê di deh salên bûrî de ev kar hate kêmkirin ji ber bilindbûna nerxê şînahiyan di bazarê de.

Di vê salê de û ji sedema dorpêçkirina abûrî li ser parêzgeha Hesekê hişt ku buhabûneke mezin têkeve li ser temenê toximê xwarinê de , û bi taybet şînahî , vê yekê hişt ku milat vegrin çandina baxçan di hewşan de ,ev diyardeya dîsa belav bû li ser bajar , her malek li Girkê legê çiqeys hewşa wê biçûk be ewê çend mişaran ji şînahiyê di hewşa xwe de biçîne ,wek xiyar , bacan , îsot û pîvazan, ev jî ji sedema giranbûna nerxê van toximan li bazarê ye.

Li ser vê diyardeyê Mistefa Mihemed welatiyek ji Girkê legê ye, ji kovara Welat re got; çandina baxçan karekî zehmete lê pêdiviyên malbata min peydadike, û gelek alîkarî bi min re kir ji aliyê diraviyê de .

Sûdeyên baxçan ne ji hêla diraviyê tenê hene, lê di aliyê civakê de jî hene û roleke mezin dilîzê di nav civakê de ;

*mirov ji xwe bawer dibe ku xwe ji hemî astengiyên jiyanê derbas bike.

* bi hêzkirina têkiliyên civakê di navbera kesên di texê de.

Her wehe li ser sûde û bandora civakî jinek ji Girkê legê Fatma Umer ji kovare Welat re axifî û got : “Her malek di taxê de cûreyên taybet diçînin ji ber tengbûna cih û kêm bûna avê , ji lewra em van cûreyan bi hev diguherin bê ku dilman û bazarî têkeve di navbera me de , ji ber ku di vê rewşê de em hemû bi hewceyên hevin”

Her tim miletê Kurd dikaribû xwe ji astengiyê biparêze bi dest û xêdana eniyên xwe, her weha vegera diyardeya çandina baxçan kar û sûdeyek baş li milet kir, ji hemî aliyan de, lê ev ne bese ku berpirsên herêmê li milet binerin bêyî ku ew tiştekî ji wen re pêşkêş bikin di aliyê peydakirina pêdiviyên jiyanê yên rojane ,û di aliyê xizmet gozarî de



# Tirbespiyê dîsan birînên xwe derman dike

Tirbespî ewbajarê pir hêmin, tije kêf û şahî ,dûrî tundûtûjiyê. Ew anuha di nav pencên tirsê de ye, û di hembêza êşê de ye, ew êş tevaya nişteciyên wê dorpêç kiriye.

Tirbespiya pir reng û deng, tirbespiya dev liken îro bûye cîwarê tirsê, wargeha tirmbêlên bombekirî, bûye ciyê teqîn, gumîn, û kuştinê.

Her ku berîneke wê qemûşk digire, birînên din vedibin, her ku xwe jibîr dike, dîsa teror, dêwên dev jihev, û dijiminên mirovayetiyê destên xwe yên qirêj dirêjî bejna wê ya bedew dikin, dirêjî xwîna nişteciyên wê dikin.

Teqîna teroristyane ya heftemîn demjimêr 8 û nîv ê êvarî roja 14.06,2014 an qewimî, û xelkên bajêr tevde xistin nava tirs û êşeke mezin de.

Lêvêcarê ne mîna her car bû, vê carê jimara şehîdan pir mezin bû, birîn pir kûr û dijwar bû.jimara kuştiyên wê 13 şehîd bûn. Ku li ser destê terorîstan û dijminên mirovahetiyê hatin şehîdkirin.

Destên teroristan yên ku şîn û reşî xistin bajêr, yên ku zarokên me sêwî hiştin, yên ku bûkên me bê zave hiştin, yên ku dilê dayîk û bavên me biraştin..yên ku hemî bîranînên me yên ciwan hilweşandin, yên ku wêne, xeml û xêla bajaêr guhertin. Ev terorîstên ku tenê mîna kuçikên kolanan bi şev derdikevin nêçîrê, nêçîra xwîna mirovan… terorîstan bi dehan firoşgeh, mal û war herifandin, bi dehan birindar li dûv xwe hiştin.

Tirbespiya ku tirs, kuştin û talan û wêrankirin bûye mîna xewneke giran li ser sînga xelkê wê lê tevlî van birînan, tevlî van êş û derdan, tevlî van kuştî û birîndaranTirbespî wê bimîne keleha serhildan, bajarê pir xweş û şêrîn bi pêkhatiyên xwe, bi Erebên xwe, Kurdên xwe, Suryanên xwe





# Li bajarê hesekê yek rêbaz bû fêrkirina zimanê kurdî

**XALID UMER**

Tiştê herî bala mero dikşî ne li kurdistana Sûrî guhdana li zimanê kurdiye.
Bajarê hesekê yek ji bajarên kurdî yê serekeye ji hêla fêrkirina ziman de, nemaze ku nivîskarên bajar bi piraniyaxwe bi ziman ê kurdî dinivîsin ev ji hêlekê ve û ji hêladin vejî komîta fêrbûna zimanê kurdî ya bi nav û deng bargeha wê li bajarê hesekê bi xwe ye, ku bi sedan xort û keç ji hêla vê komîtê ve hînî zimên bûne berî şoreşê, û ji wan bi dehan bûne mamoste yên zimanê kurdî.
ji despêka şoreşê ve, ev camêrana –mamoste û nivîskarên zimanê kurdî- roleke xweyî hêja lîstin nemaze piştî vekirina navend û dezgehên partiyan û derfeta vekirina xulên ziman û dana waneyan.
YEKîTIYA NIVîSKARêN KURD şaxê HESEKê ya piraniya nivîskarên wê bi nav û dengin mîna\ Salihê heydo- Mehmûdê sebrî-Birahîmê xelîl\ çavdêriya dana xulên zimanê kurdî dike, û alîkariya mamoste yan dike di dana waneyan de,gelek mamoste endamê yekîtiyê bi xwe ne . piştî derçûna gelek xuleyan ,min ev pirs ji hin mamosteyan kir?
Gelo astengiyên têne pêşiya we ta vê kêlîkê çine?
-Mamoste Hisên mamê dibêje: tiştê herî sereke ku pêdiviya mamoste yan pê heye RêBAZEKE YEKBûYî ji bo fêrkirinê.
-Mamoste Salar salih dibêje:em dikevin ber fedyê gava hinek şagirt dibêjin: wateya vê gotinê li navendek din ne wilo ji mere gotin, lewra rêbazeke bêjeyan gereke.
Mamoste Hekîm Revê dibêje:nakokiyên di navber ziman zanan de bandora xwe li mamosteyan dike ,em hewcedarê yek rêbertiyê ne bo ziman.
Mamoste nuhrîn ebdilqadir û Mamoste dilşad ‘ebdo dibêjin:bi navkirina navên tîpên deng yên zimanê kurdî ji navendekê heat ya dî ne wek heve,li ciyekî dibêjin dengdar û li yê din dibêjin bê deng ,û wilo
Mamoste Amanc qado dibêje: navenda ku ez lê waneyan didim di nav taxên birayên meyî ‘ereb de ye,piraniyên şagirtan ne kurdin , lewra em hewcedarî rêbazek bo fêrkirina biyaniyan yan ejnebiyane.
Mamoste birahîm xelîl dibêje:di nerîna min de pêdiviya şagirtên kurd bo rêziman ne gereke,tenê divê qonaxê de giringe şagirt fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bibe.
Li gor nerînên mamosteyan bi tevayî ,YEKîTIYA NIVîSKARêN KURD li bajarê HESEKê li navendên bajêr geriya, û biryara çêkirina rêbazeke yekbûyî bi alî kariya van navendan derxist.
Biryar ewe ku ji her navendekê yek û ji yekîtiya nivîskaran 6 endam wê bi hevre rêbazeke yekbûyî derxin û her weha rêbazek bo biyaniyan jî derxin. Wê ev rêbaz li van navendan teva bête dan,her weha wê ezmûn jî hevbeşbin,di rêbazê de wê taybetiya Kurdistan a Sûrî ber çav be.
Gelo ev pirojeya YEKîTIYA NIVîSKARAN gava yekemîne bo çareserkirina pirsgirêka zimanê kurdî, yan wê ji bajarê hesekê dernekeve



# Dezgehên civaka sivîl û pêşeroja ne diyar

**RAMAN ÎSA**

Bê guman sedemên hebûna Dezgehên Civaka Sivîl( DCS), ewe ku çi deverên di Cîhanê de kêşe û Pirsgirêk lê hebin , li wan deveran ev rêxistin Avadibin, mîna rewşa Sûriyê ya niha, di vê qonaxa tarî de.û bi taybet herêmên Kurdî,bajarê Hesekê wek nimûne..

ku di vê dema Dawî de pir kêşe , Pirsgirêk û nerehetî ketine civakê de , bi taybet ew şerê ku di demên çûyî li bajêr rûda , bandoreke xwe yî neyinî li civakê kir , û ji encamê wê bilindbûna asta nakokî û dijîtiyê di navbera pêkhatiyên Kurd û Ereb de..li vir bêhtir rola saziyên civaka sivîl pêwîste, ji ber ev rêxistin bi xwe ji boyî çareserkirina kêşeyên civakî û pêşvebirina bîrweriyê di civakê de hatine damezirandin .

Eger mirov li dîrokê vegere , tê xuyakirin ku pirojeyên avakirina saziyên civaka sivîl girêdayî avakirin û pêşketina bajara ye , û bi hev re têkildarin . lê li Sûriyê wek em dibînin , ev sazî hatin damezirandin di qonaxên hestiyar de û demên ku bajar û bajarok rastî bombe baranan tên û diherifin

Careke din em vegerin li ser rewşa herêmên Kurdî , û bi taybet Hesekê ku gelek sazî û dezgeh bi navê civaka sivîl lê hatine avakirin ,û bajarê Hesekê yekemîn bajarê kurdî ye ku saziyên civaka sivîl lê hatin damezirandin,û sedema vê yekê ewe ku Hesekê bajarekî gelek pêkhatî tê de dijîn, lewra pêdiviya Civakek Aştiyane, pêwîst bû ji bo Parastina hevjiyanê…ev ji hêlekê ve , ji hêleke din ve jî ev sazî dibin pêşende bo pêkanîna dadmendiya veguhez .

Ji ber rewşa ewlekarî ya bajêr, û destdirêjiya rêjîma tek Partî di nav pêkhatiyên Ereb , Kurd , Xiristiyan de… ev dezgeh tenê man di çarçewa kurdî de, û ew bû sedemek ku sergeyên civaka sivîl nagihên serî .

Piştî danûstandinên dirêj , bi hin endamên civaka sivîl re , bi giştî nerînên wan, nemaze di vê rewşê de , ev bûn : têkiliyek xurt û ber çav gereke di navbera rêxistinên siyasî û dezdehên civaka sivîl ,ta ku karibin vê qunaxa hestiyar bi kêmtirîn ziyan derbas kin





# Jin di navbera mafê rewa û nirîtiyên civakî de

**Efsan- Ronî**



Bi destpêka şoreşa Sûriyê hemû dîwarên tirsê hatin rûxandin , ne tenê tirsa rêcîmê lê belê tirsa civakê jî pêre hêrifî .

Di demekê de ku civaka Kurdî bi nerîneke biçûk li jinê di nêrîn ,û jin di ramanên wan de tenê bo xizmeta malê û perwerdeya zarokan bû.

Lewra zayina vê şoreşê bû sedem ku ev yasa û zagonên nirîtî yên ku li ser jinan pêkdihat werin guhertin , bi taybet piştî beşdarbûna jinan di xwepêşindanan, û tevgera wan di daketin û meşa kolanan de.

Û bi dirêjbûna şoreşê re jinan xwestin ku li cihê xwe di nava civakê de bigrin bi her awayî , çi di nava rêxistinên rêzanî û çi di nava sazî û komîteyên sivîl de.

wek ku tê zanîn di dema dawî de bi dehan rêxistinên jinan li Rojava avabûne , hin ji wan bi partiyên rêzanî ve girêdayî ne û yên din serbixwe ne.

û ew di bin duruşme ya parastina mafê jinê kardikin

lê jin îro wek em dibînin ne tenê di warê rêzanî de kar dike, belê ew beşdarî hemû çalakiyên civakî dibe û her û her gotina (jin nîvê civakê ye) tekez dikin ,û ew bi xurtî adatên û gerdişên ku mîna zagonan di civaka Rojhelatê de hatibûn naskirin dişkînin.

Lê pirsa herî giring, gelo jin dikare mafê xwe yê rewa pêk bîne di nava civaka Kurdî de ya ku hîn girêdayê nirîtên xwe ..?

Li gorî rapirsînek taybet bi Welat li bajarê Amûdê ,du nerînên cuda têne xuya kirin:

_Beşek dibêje ew ji mafê jinê ye ku li himber mêr bi serbestî ,bi hemû karî rabe ,bêyî tu mercan ,ta ku jina kurd nemîne çav girtî ji pêşketina ku îro li seranserî cîhanê çêdibe û ew tekez dikin ku rizgarkirina jin û tevlîbûna wê di civakê de, lê dibe ku jin palbenbe bi erkên xwe di malê de jî.

_Lê beşê din nerazîbûna xwe tînin ziman ,û ew bi ramanên xwe bawerin û dibêjin dewlemendiya me Kurdan di sinc û perwerdeya me de ye, ew jî girêdayî ye bi nirîtên me.

Lê ev beş tevî nerazîbûna wan lê qet ew xwe nabînin dijî pêşketina jinê.

Eger karê wan di bin sîwana nirîtî û kultûra civakî de be.





# Dêra Mar Asya Elhekîm..

**Saadon Al Sîno**

Dêra Mar Asya hate avakirin di sala 1932an de jikelpîçan,û bi li ser xakeke bi dirêjahiya 40 mitrî û firehbûna 40 mitrî,û li dedorê wê 4 kolan ji bajarê Dirbêsyê.
Û di sala 1949ê de hate çaksazkirin û vê carê bi kevir û çementoyê.
Ev Dêr bi ferehbûna xwe têra 250î kesan dike.û ew di navenda bajêr de ye, Siryanên Ersezoks dihêne wê ji her deverê Sûryê,û bitaybetî di cejna Mar Asyayê de. Baba Behnan Yakûb li ser wê wisa ji me re axift:ev Dêr berdewamî e ji Dêra ku li Mensûryê ya li Tirkyê bû,û sedema wê ew bû ku xelkên Mensûryê ji îşkenceyan reviyabûn di despêka sedsala 20an de,di komkujiyên ku têtin binavkirin Sîvo,û jiber ku devera herî nêzîk ji Mensûryê re bajarê Dirbêsyê bû,xelkên wê hatine vir.di dema ku hin xanî hebûn û Qişleyeke Ferensiyan di wê de hebû,û xelkên Mensûryê xwe li wê girtin. Dêra Mar Asya yek ji şûnwarên kevin in di Dirbêsyê de,û bi hebûna wê hevjiyana pêkhatyên bajêr bi wêneke xweş tête tekezkirin ji Kurd,Siryan û Ereban û ji despêka avakirina vî bajarî.
Û dema ku mirov dibîne çawa asîmanên bajêr bi minara Dêrê û Mizgeftên wê têtin xemilandin,ew dibe nimûne ji jiyaneke hevbeş re ku herkes di wê de bi rewşeke xweş û aştyane dijî

# Werziş cudahiyan saz û hembêz dike

**Xalid Şêxo**

Bê guman bajarê Serê Kaniyê di gelek rewşên dijwar û aloz de derbas bûye ji berya du salan de, lê vîna jiyanê ji hemî alozî û kêmasiyan bi hêztir bû li gel xelkên bajêr bi hemi pêkhatiyên xwe , bi taybetî ji piştî rizgarkirina Serê Kaniyê ji komên tundrew û radîkal , wek Dayiş û hevkarên wê .
Ji wê de, jiyan hin bi hin xwe digre li ser rûyê bajêr bi saya gelek çalakiyan û di sebareta pir dorhêl û babetan, nemaze di ware sivîl û çand, hunerî û werzişî jî, ji ber ku van çalakiyan bi giyanê cemaweran pêk tê û beşdariya hemû kesan tîne bi cihanîn di her gave de.
Ji lewma jî pêkanîna werzişê, bi taybetî Fotbolê gelak agedarî û balkêşî sitendiye li gel nifşê ciwanan, û li ser vê astê û xwestekê gelek pêşbaziyên fotbolê hatin rêxistin,û bi beşdariya jimarek ji tîmên bajêr û gudewarên wê, dibin çavdêrî û rêvebirya komîta werzişî ya pispor , û bi helkeftina girûpên werzişî yên ku di warê fotbolê dixebitin.
Ew komîte li ser bûyina pêşbaziyan û lîskên di navbera tîman de karê xwe pêk tine,û xelatan radest dikin bo tîmên serkeftî di encama pêşbaziyan de .
Lîzgeha Ş.Rustem Cûdî bû navendek bo van pêşbaziyan û kesên bajêr tevde li hev civand û hembêzkir, li ser bingeha hezkirin û lêborînê û giyana werzişiyê , bi amadebûna cemaweran diyar bû ku vehesiyek li cem milet heye li dirêjahiya wan pêşbaziyan û ev bi xwe tekez kir ku vîna jiyanê û hevjiyana hevbeş bi hêztire ji gefînê û pêdawistên wê, ev tişt diçespîne li ser peyva ku dibêje:
"Tiştê ku rêzanî cudahiyê di navbera wan de diçîne , werzişî dîsan wan kom û saz dike "
Li ser vê dorhêlê 'Welat' berê pirsa xwe da li hinagedarên van pêşbaziyan, ma gelo çawa dinerxînin vegera çalakiyên werzişî li bajêr ? ma raste ku bandora vî tiştî li ser jiyana welatiyan heye û diyare ?
-mamosta Azad Eyanê, agehdare û baldarê werzişiyê ye , ji me re got
Piştî rizgarkirina bajar ji komên çekdar, û vegera jiyana normal bi rengekî asa û ber çav wek vegera şopa dibistanan û gelek ji pêdiviyên jiyanê û çalakiyên cemawerî û çandî û werzişî, ev tişt bandorek erênî li ser rola werzişiyê kir , ya ku ew jî vegeriya çalakiyên xwe li ser lîzgeha Ş.Rustem Cûdî. Û bi amadebûn û beşdariya gelek ji welatiyan , ev tişt nameyek dilniyayî dişîne bo kesên me ên li derve da ku ew jî vegerin, ji piştî ku jiyanek suriştî û aram û amoşî peyda bûye.
-Fadil Fadilo , lîztikvane û emdamê komîta werzişiyê di pêşbaziyan de li Serê Kaniyê, wî jî bo me wilo got
Em di komîta werzişiyê de bi karên xwe radibin, bo ku em berz û bilind bikin werzişiyê, û ji şaştî û kêmasiyan derbas bibin, em her gavê rexnan hembêz dikin di hêla fotbolê , da ku karê me xweştir bibe û em bi erkên xwe rabin bi rengekî baştir, û nameya me heakirin û biratiye bo bo hemû pêkhatiyên bajêr û em bangewazekê dikin bo cemawerên xwe ku alîkar û beşdarbin di bilind kirina werzişiyê , û nemaze fotbolê li bajarê Serê Kaniyê



# Hevpeyvîn bi mamosta Mihemed Cezaa re

## Li ser rola ciwanan di warê rewşenbîriyê û belavokan de

*Xweşnav Heso*

Me xwest hevpeyvîneke bi nivîskar û rewşenbîrê Kurd Mihemed Cezaa re li darxînin, ji ber ku pêwistiyeke wê heye, û da ku em bi hev re li ser çend xalên giring rawestin, û çend babetên hêja ronî bikin .

Welat- mamosta Mihemed wekî hemî caran , xwe ji xwendevanan re bide nasîn , tikaye .

M.C - Di destpêkê de ez sipasiya we dikim li ser vê serdanê, navê min Mihemed Cezaa e, bûna min li navçeya Dirbêsiyê bû di sala 1943 an de, xwendina min di destpêkê de li gundê Qermanê bû, û ya amadeyî li Dirbêsiyê bû, û ya navendî li Hesekê bû. Û xwendina xwe ya zankoyî min li zanistana Şam ê kiriye,beşê ziman û wêjeya Erebî.

Di ciwaniya xwe de, ango di dema avakirina yekem partî Kurdî li Sûrî ji 1956an de, ez nêzîkî ew kesên hîmdar bûm, û nasiya min bi gelek ji wan hebû, û belê min jî di vê partiyê de kar kir,û li ser dirjahiya sê salan ez berpirsyarê xendevanên Hesekê bûm, ta bi sala 1963an, wê demê min dest ji karê rêxistinî kir,paşê em hatin Serê Kaniyê û ez ji çalakiyên rêzanî dûrneketim, ez mam li ser soza hevaltiyê û rêça kar û xebatê.


Di sala 1991ê de min pirtûka Reşîdê Kurd ya rêziman wergerand zimanê Erebî, û di encamê de, ez ji karê xwe yê fermî wek rêvebirê navenda çandê de hatim dûrxistin, û min veguhezê zeviyên derdora bajêr kirin, û helbet vê gavê ez tenê dixwînim û dinivsînim.

Welat- Mamosta, rola navenda çandê li ser ciwanên Kurd hebû wê demê?

M.C – di wê demê de çalakiyên çandî gelekî balkêş bû, û ciwan bi piraniya xwe dihatin pirtûk dibirin bo xwendinê, şano li dardiket, civîn dibûn,helbest û mûzîka Kurdî û filklora Kurdî dihatin pêşkêş kirin, û kesên beşar dibûn di çalakiyên navendê de bêtirî xwe Kurd bûn. Lê ji piştî ku min ji karê min dûrxistin ew karên ciwan tevde wenda bûn.

Welat – pirtûkên te ta vê gavê çi hene ?

M.C –



1- wergerandina pirtûka Reşîdê Kurd a rêzman di sala 1991.

2- Rola Kurdan a rêzanî li Sûryê , di sala 1999.

3-Nivîskar û helwest , di sala 1994.

4-serjimara awarte li herêma Cezîrê.

5-tekoşerê mezin Hemzê Newêran, sala 2013.

Welat – aloziya gihiştina di navbera nivîskar û xwendevan li gorî te çiye gelo?

M.C – bê guman dem hatiye guhertin, û van rojana êdî Face book dewsa gelek pirtûk û nivîskaran girtiye, lê birastî gihiştina ku ne di riya pelan de be ewê gihiştinek pûç û sist be ,gereke xwendevan xwendina bilez nekin, da ku jibîrkirina bi lez li wan peyda nebe, û aloziya bêtir ew pêk tê ji ber nivîskar

jî, ji sedema sawîrên berz û bilind, erke li ser nivîskar ku tiliyên xwe deyne li ser êşa gelê xwe , ku nasbike daxwazên wî çiye,  û belê ji nivîskar û xwendevanan tê xwestin ku rêzgirtina civata xwe bikin û dûrkevin ji bedên peyvan û paşgotinên tûj .

Û ez dixwazim  şîretekê bikim ji nivşên nû re, ne her tiştê nivsandî têne belavkirin.. û di warê nisandinê de hedan û kûrbîniyek gereke, da ku berhemên xweş û bedew pêşkêş bibe.



Welat – di vê qonaxê de, çi ji ciwanan tê xwestin ?

M.C – her demê bila li rastiyê bigerin , tenê li navdariyê mijûl nebin , hin bi hin rastîniya tiştan têbighêjin , û li rastiya rastiyê bixebitin û binkolin , her tiştî binerxînin li gorî dema wê ,û divê ku em êdî xwe ji nexweşiyên berê rizgar bikin.

Welat – piştî şoreşa Sûrî, çi guhertin di warê nivîsa bi Kurdî de bû ?

M.C – bê guman ezmanekî fereh li pêş ciwanan vebû û gelek dorhêl peydabû bo nivsandinê û belavkirinê , ez dilxweşim vê gavê ku dibînim bi awayekî serbestî hûn kovarên xwe belav dikin, û ez tînim bîra xwe gava me bi dizî helbestek dinivîsand û bi dizî çap dikir, her tişt bi dizî û tirs bû, temeya min ji gelê min heye ku hewlê bidin xwe hêj binivîsin, ji ber ku Dr.Nûredîn Zaza digot:

“Bila xort binivîsin , û bila kêmasiyên wan hebe,ne xeme, ji ber ewê rojek bê ku ewê kesên din li dû wan werin û kêmasî û şaştiyên wan serast bikin !”

Bila ciwanên me her demê binivîsin, û li nivîsên xwe gelek caran vegerin, wê gavê ewê hin guhertinan bikin û hin şaştiyan dûrbixin.


Welat – mamosta tu çawa belavokên me yên nû dinerxîne, çi ji hêla nivîsan û çi ji hêla nivîskaran ?

M.C – ez gelekî kêfxweşim û serbilindim her gava ku hûn kovara xwe radestî min dikin , li ser mijara babetan gelek cur û cure û zengîne , û li dorhêla nivîskaran ez bawerim ku ewê xwedanên pênûsên zêrîn bin di pêşerojê de, ez her gavê serkeftinê ji we re dixwazim.


Welat – dezgeha Welat a ragihandinê , ji bilî kovara Welat ,êzgehek nû damezrand , 14ê Cehzêranê serotar bû ji weşana wê re , tu çi ji bo karmendên Welat û teva xwendevanan dibêje ?

M.C – ev karekî pîroze , û birastî ez xwe dibînim wek endamekî di vê dezghê de , ji ber ku karên wisa xizmeta civakê tevde dike , bi taybetê warê çandê û hunerê , wêje û ramanê jî , hêvdarim ku dergehê rexnan jî her dem vekirî be , da ku Welat bêtir pêşkeve , û bi helkeftin û beşdariya ciwanan ji hemû bajarên Kurdî ez bawerim ku hûn weke yek destî ne ,ewê karê wê bi hêztir û bilindtir bibe ,her serkefî bimînin.

Û ji bo radyo Welat , ez hêvî dikim ku weşana wê bighêje Serê kaniyê û hemî bajarên din , tenê hêvîdarim ku di nava weşanên xwe sitranên resen ên Kurdî hebe, ji ber ku ew sitran dîrok û wêjeya Kurdî hemû hilgirtiye ji mêj de , û sipas dîsa bo serdana we , û serkeftin bo kovara me Welat



# Sîpan Hota ... hin xewnan ji Amûdê av dide



*Sîpan Hota navekî ciwan e li bajarê Amûdê li dûv xewnên xwe di cîhana sînema û wênekişandinê dikeve , tevî ku hîn wî asoyê dixwaze nedîtiye bo xewnên xwe pêk bîne lê ew bi israr e ku li vir û wir karê wî roniyê bibîne , derbarî serpêhatiyên Sîpan Hota di warê sînema û wênekişandinê herweha rewşa sînema kurdî li Sûriyê jî kovara welat ev hevdîtin bi wî re kir*



***Sîpan Hota çi hişt ku tu nêzîkî kamîrê bibe?***

Ez dibînim kamîra min weke hevalekî herdem bi min re ye, min ew kedî xwe kirye, ez karim di vê derbarê de bêjim ku ez bê wê nikarim gavekê bavêjim, ez hîn benda di orta xwe de û kamîrê de girêdidim

Hîn pir aliyên di hevalê min de hene demek dirêj divê ta ez wan nasbikim

***Sîpan Hota bêtir tu ji kişandina wêneyan an ya fîlman nêzîk dibînê?***

Em nikarin kişandina wêneyan ji çêkirina fîlman cûda bikin, pir caran wêneyek tu dikare wê bike fîlmek an ramanek wêneyekê jêre bikşîne an fîlmekî belgî li ser derhîner bike

Ez serxweşiyeke nediyar dibînim tenê ku kamîre bi min re be

***Sîpan derbarî karê sînema ta niha te çi kiriye û çi li pêşiya te heye?***

Fîlmekî kin di sala 2013 min ew kişand û derhêner kir, fîlm bi navê " Boy and a Ball " bû, bi vî fîlmê ez beşdarî festival kamîra erebî li Holenda, Rotirdam bûm

Di dema nuha de min fîlmekî din kişand bi du derhêneran " Hesen Helîmê û Mîral Gêlo " re ji bajarê Amûdê yê ku fîlmê xwe nî yekemîn derhîner dikin

Hin pilan di paşerojê de hene bo kişandina fîlmekî belgî di demek pir nêzîk de

***Sîpan tu çawa li rewşa sînema kurdî li Sûrya yê dinere?***

Temenê sînema Kurdî li sûrya yê biçûke, ez dikarim bêjim derhînerên Kurd nuh derfet hat ji wan re ku sînemak cûda avakin, sînemak ku fîlmên wê beşdarî festîvalên cîhanî bibin

Sînema kurdî li Sûrya yê hîn di asteyek zikmakî de ye, hîn girûpên akadîmî di derbarê sînema de avanebûne, ev derfet ji tevaya derhînera re wek xewnekê bû bi rastî

Sedemek din heye li ber pêşketina sînema Kurdî li Sûryayê ewe gêmbûna organayzên sînema û piştgirtina derhêneran û astengiyên aborî bû çêkirina fîlman bi rengekî profîşînal

***Sîpan ev rewşa xerab ku herêmên kurdî û sûrî têde derbas dibe gelo tê karîbe bi fîlmekî tenê heqê wê bide wê an bêtirî fîlmekî jêre dive?***


Dîrok aniha li welat çav li cîhaneke nu vedike, ez bi xwe nikarim dîroka milletekî an welatekî di fîlmekî de bi tenê wêneya herî zelal bidim xuyanî

Lê bi hêvî me ku bi fîlmekî dirêj an dudwan wê wêneya herî reş û sipî derhêner bikim bû xerabiya li welatê me

***Sîpan di civaka xwe de tu dibînî ku derdora te qedrê kamîra te digirin?***

Kişandina wêneyan ez bi xwe dikim bû dana canekî din ji tiştên mirî re, dana jiyanekî nû ji derdora xwe re, ez wêna dikşînim bû tî bûna di canê xwe de av bidim

Hin kes hene biryara wan ji minere cihê piştrastiyê ye, kesên di civakê de bi rastî her kesek li gorî paqijiya çavên xwe li wêneyên min dinerin





# HEJÎR

Dr. Hajî M.

Dara hejîrê kevintirîn dare li ser rûyê gerdûnê ,ev dar ta 15 mitran bilind dibe,xêzmîla sîka darê di nîvê rojê de ta 12 mitre erdê digre, ji ber sîka wê a tarî xwe kirina di bin dara hejîrê de pir xweşe. Welatê dara hejîrê Karya ye , Karya herêmek kevne ji heremên rojava yên çiyayê Zagrosê ye nêzî derya sipî ye . Hejîr di ola Misilmantiyê de mêywek pîroze , ji bir yezdanê mezin bi hejîrê sûnd xwariye û Gotîye (التيـن والزيتـون). Li cem Rumaniyan jî pir pîroze , ew bawer dikin ku Gûrê ku bi şîrê xwe herdu bira Ramus û Rumulus xwedî kirin û mezin kirin , di bin dara hejîrê de diman û jiyan dikirn, Ramus u Rumulus her du birayên ku împeratorîya Romanî saz u avakirine. Zanistê Yonanî Pilînî 29 beşên hejîrê dane zanîn û li ser wan nivîsandiye . Hejîr bi du rengan tê xwarin

1. hejîrên ter û pijiyayî ser rast ji darê tên çinîn û tên xwarin.
2. hejîrên li ber tavika rokê ziwakirî an jî jê re dibêjin hejîrên hişk ,ev di kulînan de tên parastin ta mehên zivistanê û di şevên sar u cemidî de tên xwarin .


Hejîr pir zengîne bi: 1. Kalsyom.
2. Potesyom.
3.şekir.
4.Fosfor 5.
vîtamin A. vîtamîn B. û vîtamîn C .
6. Benziyal dêhayd .
7 -Omêga 3 û Omêga 6.

Sûdeyên Hejîrê : ji ber bilind bûna asta Şekir di hejîrê de dibe wek çavkaniyek înêrciyê ya xurt ji bo karê mêjî û masulkên laşê mirov Ji ber zengîniya hejîrê bi Kalisyom pir başe ji bo parastina hestîyên laşê mirov ji nexweşiyên hestiyan wek hestî xûruman ,bi taybetî li cem kal û pîran. Hejîr pir bi sûde ji bo nexweşiyên dil û damaran , herwiha ji bo parastina roviya zirav û kolonê mirov ji nexweşiya penceşê rê. ji bo nexweşiya Gaut bi berfirehî tê bi kar anîn . Ji bo dermankirina nexweşiya roviyên lawaz çi li cem kala be, çi jî li cem zorokan be, 6 heb hejîrê ziwakirî + qedehek donê zeytûnê +leymunek baş hurkirî, hemî tev de têxin sênîkekê de û 24 demjimêran bihêlin bi hev re , û paşê her roj li xurînî 2 kefçiyan ji wê bixwin ,û noşî can be



# العدالة الانتقالية

الناشطة الحقوقية : ديلمان السينو



يقول هيغل في تفسير بحث الانسان عن الحقيقة : «سوف يظل البحث عن الحقيقة يوقظ حماسة الانسان ونشاطه مابقي فيه عرق ينبض وروح تشعر ..»
فما بالك حين تبحث الضحية عن الحقيقة ؟
لعل ذلك يختزل في ثناياه فكرة العدالة الانتقالية ومجال اختصاصها ونطاق عملها .

**- ماهي العدالة الانتقالية :**

تعرف العدالة الانتقالية بانها مجموعة الاساليب والآليات التي يستخدمها مجتمع ما لتحقيق العدالة في فترة انتقالية في تاريخه , تنشأ هذه الفترة غالباً بعد اندلاع ثورة او انتهاء حرب حيث يترتب عليها انتهاء حقبة من الحكم السلطوي القمعي داخل البلاد وبدء مرحلة انتقالية نحو تحول ديمقراطي .
بشكل اخر العدالة الانتقالية هي فترة او مرحلة ما بعد الازمات "الثورات" يقصد بها العدالة التي تنتقل بالمجتمعات من حالات الصراع الى حالة التوافق والسلام وصولاً الى نظام ديمقراطي يمنع تجدد الصراعات والنزاعات .
وتشير الى مجموعة التدابير القضائية وغير القضائية التي قامت بتطبيقها دول مختلفة من اجل معالجة ما ورثته من انتهاكات جسيمة لحقوق الانسان .
تتضمن هذه التدابير الملاحقات القضائية ولجان تقصي الحقيقة وبرامج جبر الضرر واشكال متنوعة من اصلاح المؤسسات .

- تركز العدالة الانتقالية على الاقل على خمس مقاربات اولية لمواجهة انتهاكات حقوق الانسان الماضية :
١- المحاكمات : لاسيما التي تطال المرتكبين الذين يعتبرون اكثر من يتحمل المسؤلية سواءً كانت المحاكم المدنية او الجنائية , الوطنية او الدولية , المحلية او الخارجية .
٢- البحث عن الحقيقة وتقصي الحقائق : سواءً من خلال تحقيقات رسمية وطنية مثل لجان الحقيقة او لجان التحقيق الدولية او آليات الامم المتحدة او جهود المنظمات غير الحكومية .
٣- : جبر الضرر : الذي تعترف الحكومات عبره بالاضرار المتكبدة وتتخذ خطوات لمعالجتها سواءً من خلال التعويض الرمزي او المالي او اعادة التأهيل .
٤- الاصلاح المؤسساتي : بما في ذلك الاصلاحات القانونية او المؤسسية وازاحة مرتكبي الافعال من المناصب العامة واقامة تدريب حول حقوق الانسان للموظفين العموميين .
٥- اقامة النصب التذكارية و تأسيس ما يسمى بالذاكرة الجماعية .

**- اهمية العدالة الانتقالية :**

على اثر الانتهاكات الجسيمة لحقوق الانسان , يحق للضحايا ان يروا معاقبة المرتكبين ومعرفة الحقيقة والحصول على تعويضات .
ولان الانتهاكات المنتظمة لحقوق الانسان لا تؤثر على الضحايا المباشرين وحسب بل على المجتمع ككل , فمن واجب الدول ان تضمن بالاضافة الى الايفاء بهذه الموجبات عدم تكرار تلك الانتهاكات وبذلك واجب خاص يقضي باصلاح المؤسسات التي اما كان لها يد في هذه الانتهاكات او كانت عاجزة عن تفاديها
وعلى الارجح ان تاريخاً حافلاً بالانتهاكات الجسيمة التي لم تعالج سيؤدي الى انقسامات اجتماعية وسيولد غياب الثقة بين المجموعات وفي مؤسسات الدولة فضلاً عن عرقلة الامن والاهداف الانمائية او ابطاء تحقيقهما كما انه سيطرح تساؤلات بشأن الالتزام بسيادة القانون وقد يؤول في نهاية المطاف الى حلقة مفرغة من العنف في اشكال شتى .
ان تحقيق العدالة الانتقالية هو السبيل الوحيد الذي يضمن تحقيق العدالة والانصاف للضحايا وبنفس الوقت يفتح الطريق لتحقيق المصالحة الوطنية التي بدونها ستكون الدولة عرضة لمزيد من الاحتراق واراقة الدماء التي سيقف وراءها الانتقام بكل تأكيد .

**- اهداف العدالة الانتقالية :**

تهدف العدالة الانتقالية الى تحقيق جملة من الاهداف من بينها :
١- وقف الانتهاكات المستمرة لحقوق الانسان
٢- التحقيق في الجرائم الماضية واحالة الجناة الى المحاكم الوطنية او محكمة الجنايات الدولية حسب الاختصاص
٣- تعويض ضحايا انتهاكات حقوق الانسان
٤- تأمين سلام ووئام دائم
٥- تحقيق المصالحة الوطنية
٦- تفادي وقوع انتهاكات مستقبلية

ولتحقيق تلك الاهداف لابد من اتباع بعض الاستراتيجيات .

**- استراتيجيات العدالة الانتقالية :**

للعدالة الانتقالية العديد من الاستراتيجيات التي يمكن تقسيمها الى نوعين

١) - استراتيجيات غير قضائية : وتشمل :
١- اصلاح مؤسسات الدولة .
٢- تعويض المتضررين او أسرهم سواءً كان تعويض مادي او رمزي .

٢-) استراتيجيات قضائية : وتشمل :
١- الملاحقات القضائية لمرتكبي الانتهاكات لاسيما الذين يعتبرون اكثر من يتحمل المسؤولية .
٢- لجان التحقيق او وسائل اخرى للتحقيق في انماط الانتهاكات .

فلابد من ان تتضافر جهود الاحزاب السياسية ومؤسسات المجتمع المدني من اجل الارتقاء بالسير في اطار المرحلة الانتقالية لتحقيق العدالة الانتقالية في ارقى مستوياتها من خلال التنمية المجتمعية , واستثمار الموارد البشرية والمادية , والاستفادة من رعاية ودعم مؤسسات ومنظمات المجتمع الدولي لتحقيق مجتمع ديمقراطي تتحقق فيه العدالة والانصاف والسلام والوئام الدائم في مفهوم الدولة الحميدة والرشيدة

## كُوباني: مدينة تنتظر جيلاً على غير ما كان موجوداً

**بقلم: فاروق حجّي مصطفى**

مثلها مثل بقيّة المناطق والأقضيّة السوريّة، كُوباني تشهدُ تحوّلاً بشكل شبه جذري، وإنْ كان ثمّة من يتحدث عن تحوّلات على مستوى الشّرق الأوسط ككل، فإنّ أهالي كُوباني ومن يعرفها قبل الثورة يلاحظون التحوّل الذي جرى في بنيان المدينة على المستوى الاجتماعي والسياسي ونمط العيش أيضاً...، فما أنْ انطلقت الثورة السوريّة، حتى لملمتْ هذه المدينة أبنائها المشتتين في المدن الأخرى، فاجتمعت الخبرات الاجتماعيّة والاقتصاديّة وغيرها، فمن كان طبيباً في حلب أصبح له مكان آخر في بلده، الذي سرعان ما أصبح مقرّاً منعشاً لتسيير أمور عيادته، ومن يدري، ربّما عيادته هنا تضج بالمرضى أكثر من حلب أو دمشق، وهذا ينطبق على المهندس، حيث بدأ الازدهار العمراني وارتفع سقف أسعار العقارات بشكل خيالي، وبالتوازي مع كلّ ذلك لبِست المدينة طرازاً عمرانياً جديداً. المحامي هو فقط من دخل في خانة أسوأ من السّابق، فمن لا يؤمن بشرعيّة السّلطات المحليّة يفتقر إلى العمل ومزاولة المهنة، من يزاولون المهنة في كُوباني يعدوّن على الأصابع، والبقيّة يعانون من صعوبة العيش.
من المفارقات أنّ الشّريحة الأكثر حضوراً في كُوباني على مستوى النّشاطات الدّاعمة للتغير الجاري على قدم وساق هي شريحة المحامين، فهم اليوم يشكّلون ملتقىً مركزيّاً لكل نشاطات المدينة.
أما الحزبيّ الذي تعوّد على الحياة الحزبيّة في المدن الكبرى كحلب ودمشق والرقة والمدن الأخرى، أصبح في موقع آخر، فالثورة كانت كفيلة بنقل خبراته الحزبيّة إلى داخل المناطق الكُردية، التي ما فتئت وهي بحاجة إلى مثل هذه الخبرات .
كُوباني التي كانت سبّاقة في الانخراط بالثورة، وهي المدينة الأولى كُرديّاً، التي سحب النّظام أركانه وموظفيه وسلطاته منها، تعيش اليوم بين فكيّ الكمّاشة، أو حصاراً مزدوجاً، فمن جهة حصار «داعش» حيث تقطع الماء والكهرباء، وتتحكّم بحركة النّاس وتواصلهم مع المدن السوريّة، ومن جهة أخرى عدم الاتفاق أو الوئام بين المجلسين الكُرديين، ما يعني أنّ الخوف من مستقبل الاقتتال الذاتي أحالهم إلى عدم الوصول إلى راحة البال والعقل.
هذان العاملان يقفان عائقاً أمام تعزيز المال والأعمال، اللذين كانا خيّراً للشّعب السّوري، يريد النّاس أنْ يؤمنوا مصدر خيراتهم ؛ لكنْ هذا الحصار ما فتئ يضيّق الخناق عليهم، لايكبّل حركة النّاس فحسب، إنّما يمتد لتخويف النّاس من المستقبل، تبعاً لقاعدة معروفة على المستوى النظريّ، فالاستقرار السياسي يخلق الحداثة أو انتعاشاً اقتصاديّا وعمرانيّاً، وما أنْ بدأ أصحاب المال في استثمار أموالهم في على مستوى العمران على الأقل، حتى احتدمت التحديّات التي تواجه كُوباني ما أدى لخلق معطىً آخر..
جيل جديد ناشئ، تؤسّس ذهنيته في عنتاب أو اسطنبول أو هولير، أو ترزق كُوباني طفلاً ينشأ في بيئة النزاع محليّاً، أو التنافس السلبي بين المحورين الكُرديّين. هذا الجيل أصبح غريباً وربّما مقاربته لمفاهيم العائلة والعشيرة والقوميّة والأمّة مختلفة عن الجيل الذي سبقه، والذي عاش حياته في حالة من الاستبداد السياسي.
كُوباني اليوم أمام تحدٍّ حقيقيّ، ولعلّ هذا التحديّ يفرز مرحلةً أخرى، وهي مرحلةٌ وإن كانت تعتبر من التطور الطبيعي، لكنّها تشكّل نكسة بالنسبة للجيل القديم الذي يبقى عصيّاً على تقبّل ما يفرزه الجيل الجديد، لا محال إذاً، أنّنا أمام جيل جديد مشاغب، إلّا أنّه يستطيع إدارة ذاته-إنّه ابن كُوباني الجديد- فلما لانتقبله ؟!



## التربية وحرية الفرد بين الحقوق والواجبات

حسين حاج قاسم

هناك نقطتان تتمحور حولهما حرية الفرد» الحقوق والواجبات « فمن لا يستطيع أن يوفق بين الاثنين لن يستطيع أن يشعر بالحرية ولا يستطيع أن يمارسها داخل المجتمع وبما أنك تعيش في مجتمع فلحريتك حدود فهي تنتهي عندما تبدأ حرية الاخرين.
لكل فرد جملة من الحقوق تتحدد وحسب فئته العمرية ووضعه الاجتماعي والاقتصادي وكذلك عليه جملة من الواجبات يؤديها تجاه المحيطين به,فالوالدان من حقهما أن ينجبا أطفالا لكن الواجب يحتم عليهما رعايتهم وحمايتهم وتربيتهم منذ تلقح البيضة حتى قدرتهم على الاستقلالية وادارة أمورهم والواجب الاصعب الذي يجب ان يضحي الاباء من اجله هو التربية ,فالتربية عماد المستقبل للفرد والمجتمع فلاتربية ناضجة بدون حرية ولا حرية مصانة بدون تربية والتربية رهن بالوعي الذي يمتلكه الاباء والقدرة على ايصال القيم لفكرهم مع مراعاة تطور المجتمع فلكل جيل خصوصيته وعلى الاباء أن يستوعبوا هده النقطة ويبتعدوا عن الديكتاتورية والتسلط.
وفي الوضع الراهن ونتيجة الظروف القاسية التي نمربها تظهرلنا مشكلة عندما نتحدث عن تربية الصغار الاوهي:ماذا عن التربية عند الكبار؟
وماذا بقي عندهم من القيم الخلقية والانسانية التي يجب ان يحاولوا ايصالها الى الصغار؟
فمن لا يمتلك وعيا لما جرى ويجري في مجتمعه لن يؤدي واجباته بالشكل المطلوب وسيبحث عن حقوقه ويطالب بها أما الواجب فسيهمله,و من لا يتمتع بوعي متفتح لن يستطيع أن ينشئ ابناءه على القيم الاجتماعية ولن يكون لديه القدرة على استعاب مفهوم التربية المراد ايصالها الى الجيل الناشئ حسب الحالة الاجتماعية و الاقتصادية التي نمر بها .
فأين نحن من القيم ؟ مع احترامي للقلة التي ما زالت تحمل بعضا من القيم الخلقية الا أن أكثرنا قد استغنى عنها و أتوقع أن السبب الرئيسي يعود الى الأنانية و تفضيل المصلحة الشخصية على المصلحة العامة وهي نابعة عن قلة الوعي لأن الانسان مهما صعد فبانهيار المجتمع سيسقط لا محالة
يحق للفرد أن يعمل ويكسب أموالا ليعيش حياته ويؤمن متطلبات ابنائه ولكن بذرة الطمع والأنانية داخل الكثير دفعتهم الى القيام بأعمال منافية للقيم من أجل جمع الثروة حتى ولو على حساب انسانيتهم وعلى حساب أفراد مجتمعهم .
أما الطريقة والسبيل لجمعها فلم تكن ذات أهمية فمن يستغني عن أخلاقه و انسانيته لايهمه السبيل الذي يختاره المهم أن يجمع ما استطاع ليستطيع من خلالها أن يتبوأ مكانة اجتماعية أو كرسيا سياسيا أما تلك المكانة وذلك الكرسي فالمجتمع هو من يقدمه له عندما يتغاضى عن أعماله المنافية للقيم ويقدم له الأحترام والتقدير الزائفين.
فمن كان واعيا لواجباته ومدركا حقوقه المشروعة لما استغل هذا الظرف واحتكره لمصالحه الشخصية , عليك أن تكون واعيا بأن الواجب يفرض عليك أن تسعى مع الاخرين لتطويرالمجتمع ورفع مستواه لا أن تعيش على حساب أفراده ,فلو استغنى كل منا عن منافعه ومصالحه الشخصية من أجل المصلحة العليا مصلحة المجتمع لما كان هذا الوضع المأساوي الذي نعيشه اليوم, ولواستطاع كل منا أن يؤدي واجباته كما يمليه عليه ما تبقى له من ضمير لكان الأمل أكبر في رؤية
ولو بصيص من نور الحرية الذي كان سيكبر مع الأيام



**Pirs ji Welat û bersiv li we:**

*1-Danyarê sirûda (Ey reqîb) kî bû ? , û li ku derê yekem car hat pêşkêş kirin ?*

*2-du cejnan ji cejnê Êzîdiyan bi nav bike .*

*3-kîjan helbestvan ev helbest nivsandiye?*

*Xwe danînim bo sitem û zorê   divê ez ser bilind herim gorê”«*

*4-yekem helbestvanê Kurdî yê ku helbesta azad pêk anî kî bû??*

*bo bersiva xwedavên hêja li ser van pirsan, tikaye seredana rûpela Welat bikin û bersivên xwe di peyamekê - nemeyekê de bo me bişînin.

## PEYVA WENDAYî

**Peyva wendayî ji pênc tîpa pêk tê,navê bajarekî Kurdî ye.**

*Amed-Hewlêr-*
*Mûş-rû-Mehabad-*
*Silêmanî-Nisêbîn-*
*Zaxo-Ruha-Laçîn-*
*Dêrik-av- ço.*

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| e | r | o | x | a | z | m | î |
| l | u | ç | a | f | e | n | k |
| a | h | o | v | h | a | a | i |
| ç | a | r | a | m | ş | m | r |
| î | î | b | ê | n | û | e | ê |
| n | a | l | r | û | m | d | d |
| a | i | h | e | w | l | ê | r |
| S | n | î | b | ê | s | i | n |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

## Jimara bi tenê

***Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .***

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 9 | | | | 4 | 6 | 3 |
| | | 6 | 3 | 4 | | 5 | 2 | 9 |
| 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 9 | 7 | 1 | 8 |
| | 6 | 7 | | | | 3 | 4 | |
| | 4 | | | 3 | | 2 | 9 | |
| | 2 | | | | | 6 | 8 | |
| | | 2 | | | 1 | 9 | 3 | 4 |
| 4 | 9 | 3 | 8 | 2 | 5 | 1 | 7 | 6 |
| | 7 | | 4 | 9 | 3 | 8 | 5 | 2 |

## XAÇERÊZ

**Asoyî**

1-bajarekî Kurdî li Sûryê ye – tersê hat.
2- tiştek bir bi dizî û xapandinê.
3-tersê sist – sê tîp wek hevin.
4-avrû – tersê belê .
5-tersê bir(b) – xal .
6-ezman bi zimanê Ingilîzî – tersê tavê .
7-pûşê hêrandî – tiştê ku ne kelandî .
8-zeviya mezin û pir dar be .

**Serjêr:**

1-çiyayek li Bakur .
2-navekî lawane – tersê bibe .
3-(v,ê,û,m) bela wela – tersê germ .
4-tersê bir – kar û bar .
5-tersê tevayî(b)-car (b).
6-dey, zû – ben (b).
7-destaneya mezin .
8-amûrek mûzîkê –tersê bir .

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | |
| 2 | | | | | | | ■ | |
| 3 | | | | ■ | | | | ■ |
| 4 | | | | | | ■ | | |
| 5 | | | ■ | | ■ | | | |
| 6 | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | ■ | | | ■ | | | | ■ |
| 8 | | | | | | | | |

## Pend û şîretên Kurdî

*1-Pariyê mezin,dev dêşîne .*
*2- ne jina kenok, ne jî merê fedyok .*
*3-Li ser bana qîr qîr neke, dilê neyarn bi xwe xweş neke.*
*4-min di paxila xwe marek xwedî kiriye.*
*5-ma qey tê bi dizê xwedê be ?!*

## Ferhengok

| | |
|---|---|
| إماطة اللثام | Damalên |
| الأماكن المجهولة | Derên kesnezan |
| الأماكن المهجورة | Wêrane |
| الإمام | Peşewa |
| الاختبار | Taqîkirin |
| الأنانية | Xweperestî |
| الامتياز | Serpişkayetî |
| الأمواج | Şepol-pêl |
| الانتباه | Hişyarî |
| الانتحار | Xwekujî |
| الانتداب | Raspêrî |
| الانتشال | Derkêşan |
| الانتفاء | Neman |
| الانتقاء | Desbijêrkirin |

Xweşnav Heso

توزع مجـــاناً

# Bi radyoya Welat fm re roja te xweştir dibe

Radio FM 107 Welat




Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (١٢) ٢٠١٤/٧/١٥

welat.press@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya